Ragehandin di civakê demokrasî de divê azad be

Hemdî R. Eredenî

Ragehandin bi tevayî, peywendiyek mukum bi hebûn û bicihînana demokrasiyê ve heye û giringiya wê zêdetir lê dihê bi borîna civakî di nîv geşesendina demokrasî û hevrikiya partayetî de.

Demokrasî bi têgeheştina kilasîkî, bi cih hînana berferehtirîn pişkdariya cemawerî ye, bo duristkirina bîrewerên, civakî û aborî, ku aramî û tenahiya welatiyan bihê paraztin, lê eger welatî kêmzanîn be, nikare beşdariyek durist di projeyên demokrasî de bike, zanîn mercek giring e û sitûna beşdariya durist e.

Helwîstê hukûmetan derbarê vê çendê giring e; ji yekê bo yê din cuda ye, lewra jî di deravê sîstemê dektatorî de, ragehandin yek e ji sitûnên giring yên wî sîstemê ku bişê xwe li ser rabigire, lê di diravê civakê demokrasî de ragehandin yek e ji diyardeyên karîgerên civakê medenî. Ragehandina demokrasî, rexneya bi armacên avaker li ser diyardeyên nerewa yên civakî digire, rolekê kargêr dike bo belavkirina zanyarên civakî, aborî û siyasî. Xeslet jî divên rasteqîne bin û find û fêlan li xelkê neke û rûdanan jî berûvajî neke. Hîngê, hevwelatî dişê hestê xwe bi duristî beramber doz û rûdan û kesan, bi aşkerayî, dest nîşan bike.

Bê guman; ragehandin di civakê demokrasî de, divê azad be, êxsîra deshelatê nebe, çunkî derbirîna bîr û baweriyan bi azadî, binyatekê serekî ye bo temamkirina mirovayiya mirovî û civakê demokrasî. Divê nebe dûvlang. Belku helwîstên cuda cuda dihêne têperbûn ji qûnaxa dektatoriyê berev qûnaxa demokrasiyê ne karekê asane, herwek bi serê civaka me hatî, lewra ragehandina demokrasî pêdivê zêrevaniyê ye, nek tenê li berpirs û serkirdeyan bike, belku pitir pêdivî ye zêrevanî û rexneyê li hevwelatiyan demê ku çewt dibin, çunku hîngê dê civakek çewt peyda bibe. Pêşketina internêtî di warên veguhaztinê de, îro hewldan dihê kirin, ku dengûbas li dûv hezkiria bînerî li ser ekrana TV-yê dihê pêşçavkirin, bîner daxwazê ji bêjerî bike ku wan dengûbasên ew pêdivê, bo wî pêşkêş bike. Ev jî eger e ku prosa demokrasî bazdanekê di ragehandinê de berev pêş bihavêje. Bi vê rengî, ragehandin pitir demokrasiyê bi cih dihîne.